rupel 1+_Layout 1 24.06.2022 19:17 Page 1



## Em şervanên Zîlan in!

Ew ferman e, ew sembol e, ew rêyek e, ew çalakiya yekem û dawî ye, di heman demê de ji bo me bûye bangek. Zîlan û çalakiya wê ya fedaî ya lehengî ji aliyê gelê me ve tu carî nayê jibîrkirin... ***Kurdistan Lezgiyeva / R.6***



## Tersê Erdoganî

Badê Şerê I. yê Cîhanî zayîatê tewir pîl ê eskerî yê dewleta tirke yo. Helîkopter û wesayîtê zirxinîyê ke ameyî îmhakerdiş û derbkerdiş zî cayê xo de yê. No şer bî peynîya Erdoganî û îqtîdarê ey ke bekaya xo bi nê şerî ya girê dabî... ***Xoser Welat / R.9***



## Bedena me xaka me

Talankirin-desthilatdariya laş ji bo desteserkirina herêmê/xakê (beden): Bedena jinê ji bo ku hêza xwe di nav civakê de îspat bike, di qada civakî de teşhîr dike û di heman demê de hêza xwe ya pêkanîna tundiyê jî nîşan dide. .. ***M.Azîzoglu Bazan / R.2***


# xwebûn

27 HEZÎRAN - 3 TÎRMEH 2022 HEJMAR: 132 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

# Çareserî bi azadiya Ocalan pêkan e

Meşa Gemlîkê careke din nêzikatiya desthilatî û muxalefetê di şexsê Ocalan de îfşa kir. Pergala ku li Îmraliyê hatiye avakirin û li temamî Tirkiyeyê tê belavkirin, careke din aşkera bû. Heqîqeta Îmraliyê, rewşa Birêz Ocalan, bi her awayî bandorê li ser siberoja kurdan, gelên Tirkiyeyê û Rojhilata Navîn dike. Heta ku ev heqîqet neyê qebûlkirin, avakirina jiyaneke nû ji bo tu kesî ne pêkan e. Kesên ku beşdarî Meşa Gemlîkê bûbûn, bi vê bîr û baweriyê beşdar bûbûn. Heta ku tecrîd hebe ev têkoşîn jî dê berdewam bike. Ji bo çareseriyeke mayînde, azadiya Ocalan şertê bingehîn e. Ji bo vê jî em ê ji îro şûnde têkoşîna xwe bi bandortir bidomînin... ***Hevpeyvîna Abdullah Îdîg / R.4***





## Xwestin dîrokê dubare bikin


Di 29'ê hezîrana 1925'an de Şêx Seîd û hevalên xwe hatin darvekirin. Her wiha di 29'ê hezîrana 1999'an de jî cezayê darvekirinê li Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan hat birîn. Dewleta tirk ji bo komplo, îxanet û qirkirinê li ser kurdan bidomîne di 13'ê sibata 1925'an de li hemberî Şêx Seîd serî li fen û fûtan da. Bi vî rêbazî Şêx Seîd û hevalên xwe hatin girtin. Di 10'ê gulana 1925'an de, Şêx Seîd û hevalên wî derxistin Dadgeha Îstîklalê ya Şarkê ya Amedê. Şêx Seîd û hevalên xwe di 10'ê gulana 1925'an de derketin pêşberî dadgeha ku ji bo darvekirina wan hatibû avakirin a bi navê Dadgeha Îstîklalê ya Şerqê ya Amedê. Şêx Seîd û hevalên xwe di 29'ê hezîrana 1925'an de li Meydana Deriyê Çiyê ya Amedê hatin darvekirin... ***R.3***

### RIZA UYAR

Otobusa duqat û kursiya Tinatê **R.10**

## Dixwazin êzidiyan bi hev bidin kuştin

Di berdewamê de Îbrahîm anî ziman ku li herêmê hin hêz xebatên reşkirina Rêveberiya Xweser didin meşandin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Wexta ku êrîş li ser meclisa me ya Sinûnê hat kirin di heman rojê de hin kesan got, 'Divê asayîşa Êzidxanê ji vir derkeve.' Wê demê me fêm kir ku li ser me çi plan tên kirin. Lê wan eşîrên vir li dijî rêxistinê sor kirin. Li Telezîrê tevlîhevî derdixistin. Eşîr li hev civiyan. Li vir eşîra ku gotina wan û kirina wan yek e eşîra Heska ye. Beriya niha jî dijminên vê civakê li Şengalê xwestin ku bi navê eşîrtiyê eşîrên me belav bikin. Dixwazin êzidiyan bi destê êzidiyan bidin kuştin. Lê êzidî zana ne û wê ev polîtîkaya wan negihîje armanca xwe." ... ***R.3***



## Nikarin pênûsa jinan bişkînin

Rojnamegerên ku hatin girtin, di peyamên ku dişînin de diyar dikin ku ew rojnamegeriyê dikin û tişta dikin jî ne sûc e. Rojnameger Safiye Alagaş ku di Girtîgeha Jinan a Amedê de dimîne di peyama ku derbarê girtina xwe de şand de wiha got: "Di serî de dixwazim bibêjim ku em gelek baş in û moralê me li cih e. Rojnamgeriya ku me dikir sûc hat dîtin û em hatin girtin. Lê divê bê zanîn ku tu hêz û tu zilm nikare pênûsa jinan bişkîne. Em rojnameger in û em ê rojnamegeriya xwe bidomînin. Em ji her kesên ku piştgirî dane me re spas dikin. Bi hêviya ku em di rojên azad de hev bibînin bimînin di xweşiyê de." ... ***R.2***

## MHP'yî tecawizî gelek zarokan kiriye

Serokê Teşkîlat MHP'ê yê Amedê Cîhan Kayaalp jî di çarçoveya lêpirsîna serdozgeriya Komarê de hatibû binçavkirin, hate girtin. Her wiha teşkîlata ku hatibû fesihkirin berî bi demekê jî bi îdiayên bertîl girtiye ketibû rojevê û qeydên deng ên hin kesên ji MHP'ê ku bi bertîlan kes xistine kar jî derketin holê.
Serokê teşkîlatê Cîhan Kayaalp, piştî karê wî yê li emniyetê qediya sewkî edliyeyê hat kirin û piştî ku derxistin dadgehê jî ji ber sûcê "êrîşa zayendî" di 17'ê hezîranê de hat girtin û şandin girtîgehê.
Di girteka ku îfadeya zarok lê heye de, tê diyarkirin ku bersûc ne tenê li zarokekî li gelek zarokan êrîşa zayendî kiriye... ***R.2***

## Li Ewropayê rastiya PKK'ê

Di dozê de biryara dadgeha bilind a Belçîkayê ya ku "PKK ne rêxistineke terorîst e, lê aliyekî şer e" jî hate bibîrxistin. Rast e, PKK aliyekî şer e. Di navbera dagirkeran û azadîxwazan de şer heye û PKK di vî şerî de aliyek e. Lewma ger ev şer bê nirxandin û li gor sûcên di vî şerî de alî bên tewambarkirin divê sûcên dewleta tirk jî werin destnîşankirin û li gor wê helwest bê danîn.
Di vê mijarê de jî hiqûqa navneteweyî dîsa li alî digre û hevalbendê xwe pîr û pak dide nîşandan. Lê di rastiyê de ew jî dizane ku siyaseta Enqereyê ne wisa bêsûc e... ***Felemez Ulug / R.6***

## Hegel dewleta tirke û kurdî

Hegel dewleta tirke û kurdî
Tarîxê mordemî esasî di îdeolojî ser o yeno ronayene: îdealîzm û materyalîzm. Îdealîzm de ruh, cewher yan îdea esta. Yanî nê îdeolojî de kokê her çî girêdayeyê hêzê îlahî yo. No îdeolojî bitaybetî Almanya yan Prusya de zaf vilabîyaye bî. Mîsal fîlozof Îmmanuel Kant temsilkaranê nê îdeolojî ra yew bî. Goreyê dîsîplînê ey xoza de harmonîyo ke bi destê estîya îlahîye yeno awankerdene esto. Her çî tena bi aqilî nêno zelalkerdene. Goreyê Kantî çîyêko ke teberê sînorê aqilî de yo sey "numenî" yeno zanayene...
***Dr. Îsmet Konak / R.8***

## Kurteçîroka berik ango xalîçeyan

Di çêkirina berikan de teknîkeke xwezayî bal dikşîne. Gelek teknîkê wê hene. Lê belê di bingeha her teknîkê de jî şêwaza raçandina tevnê cih digire. "Rast, Çapût, Kîrkît û Tevn"cureyên raçandina berikan ên ku herî zêde tên nasîn in. Li gorî mezinbûna berikan çarçoveya raçandinê jî tê diyarkirin. Tevna we çiqas mezin û fireh be berik jî ewqas mezin dibe. Di raçandina berikan de her bendik an jî rîs nayên bikaranîn. Lewre divê rîsê wê gelek zexm be. Ji ber vê jî herî zêde rîsê ku ji bizinan tê bidestxistin tê bikaranîn. Di demên kevin de rengên rîsan ji nebatên xwezayî dihatin bidestxistin...
***Mehmet Yildirim / R.11***

rupel 8+_Layout 1 24.06.2022 17:20 Page 1



# Hegel dewleta tirke û kurdî



Dr. Îsmet Konak




Tarîxê mordemî esasî di îdeolojî ser o yeno ronayene: îdealîzm û materyalîzm. Îdealîzm de ruh, cewher yan îdea esta. Yanî nê îdeolojî de kokê her çî girêdayeyê hêzê îlahî yo. No îdeolojî bitaybetî Almanya yan Prusya de zaf vilabîyaye bî. Mîsal fîlozof Îmmanuel Kant temsîlkaranê nê îdeolojî ra yew bî. Goreyê dîsîplînê ey xoza de harmonîyo ke bi destê estîya îlahîye yeno awankerdene esto. Her çî tena bi aqilî nêno zelalkerdene. Goreyê Kantî çîyêko ke teberê sînorê aqilî de yo sey "numenî" yeno zanayene.

Teberê Kantî de fîlozofo bîno ke Almanya de îdealîzm pawit Hegel bî, labelê Hegelî de materyalîzm zî estbî. Wendekarê ey Karl Marksî no sey "materyalîzmê mîstîkî" pênas kerdêne. Rixmo ke Hegelî de fikro materyalîst estbî, ey de xeylê "îkonî" zî estbî. Goreyê formulasyonê Hegelî, dewlete esasî formêkê îdeayo ke xurt bîyo ya. Loma o, manaya ruhî bar keno dewlete ser o. Hegelî dînamîkê dewlete yê sey keye û komelî çarçewa îdealîzmî de ercnayêne. Ey sinifa feodale û qiralîya Prusya bimbarek dîyêne. Key ke sinifa burjuwayan qewimîya, Hegelî na sinife ser o zî tayê cigêrayîşî rayra berdî. Ey waştêne ke 3 dînamîkî yanî dewlete, sinifa feodale û burjuwayan mabênê xo de aşt bibê. Bikilmî Hegelî de bimbarekdîyîşê "status quo"yî estbî. Çî yo ke formulasyonê Hegelî de zaf bale antene "serdestîya qiralî" bîye. O qetî vera monarşîyê huqûqî bî. Ey fikrîyayêne ke waştişê qiralî esasî waştişê qewetê îlahî yanî "cewherê nimiteyî" yo. Eke selahîyetê qiralî yeno sînordar kerdene, o wext qewetê îdeayî zî yeno sînordar kerdene.

Hegelî konteksê merdim û dewlete de "îtaet" formule kerdene. Çîmê ey de dewlete sey "deus ex machina" asayêne. Yanî dewlete tim sey Xizirî resena hetkarîya merdimî. Karl Marksî no tewir çend reyî rexne kerd. Goreyê Marksî dewlete hetê esasî ra "wayîrîya taybete" ya. Loma Hegel wayîrîya taybete paweno. Oncîna Karl Marks nuşeno ke koleyîye, objebîyayîşê wayîrîya taybete ya. Hegelî de "îkonkerdiş", Marksî de "îkonaklazm" estbî.

**Dewleta tirke de îdealîzm**

Çarçewa teorîya Hegelî de tenê paradîgmaya dewleta tirke rê biewnê. Serdestê tirkî îkonkerdiş yan îdealîzmê Hegelî ewro zî Tirkîya de anê ke ca bikerê. Koleyîye komelî rê ferz kenê. Ê paradîgmaya xo ferz kenê. Zerreyê na paradîgma de dizdîye, fêlbazîye, kaybazîye, kolonîzasyon, xizanîye, bêrayîrîye yenê pawitene. Serdestan butçeya şarî kelemçe kerda. Wezaretê şarî girewtî binê bandora xo û pê îhaleyan sermayeyê xo zêdînenê. Senî ke Hegelî vat, dewlete sey "Xizirî" resaye hîlekaran. Dizdî key ke game erzenê, nameyê "heqî" zî şuxilnenê. Destê înan de Quran qet kêmî nêbeno. Mîsal Erdogan her ke qisey keno nameyê heqî qet ziwanê xo ra nênano ro. Pergalê xo yê poyayeyî pê nameyê "îdea"yî nimino. Îtiqat sey "kamuflajî" yeno şuxilnayene.

**Paştîdayoxî yenê bêexlak kerdene**

Erdogan û pawitoxanê ci binê sîwana bawerîye de bi mîlyon doleran bêrayîrîye kerde. Yew zî domanê xo tewrê nê prosesî kerdî. Nameyê Bîlal Erdoganî hema yeno vîrê şarî. Xora pêro dîktatorî wina yê. Ma vajê Kazakîstan de kênekê Nursultan Nazarbayevî Darîga, Dînara, Ozbekîstan de kêneka Îslam Kerîmovî Gulnara Kerîmova zî tewrê prosesê bêrayîrîye bîyî. Otokratî seba timkerdişê sîstemê xo hem domananê xo şuxilnenê hem zî şaro ke paştî dano ci hemparê "pastaya bêexlakîye" kenê. Qaso ke Hannah Arendt nuşena "Rejîmê totalîterî paştîdayoxanê xo bêexlak kenê ke ê hemparê sucanê xo bikerê."

Wextê îdareyê Erdoganî de bêhuqûqîye sembolê sîstemî bîye. Xora dewleta tirke de qanûnê bingeyî yo faşîst estbî. Erdoganî o zî dart we. Qanûnê daristanî ame ronayene.

Kam ke hêzdar o kesê bînî gêno binê bandora xo. No nîzam mîyanê mafya de esto. Dewlete nika bi destê endamanê mafya yena îdarekerdene. Ê kesî rê hesab nêdanê. Dozgerî û dadgerî kerdê pawitoxê kêberanê xo. Qesrê Erdoganî yeno sey zîyaretgehî hesibnayene.

Dozgerî û dadgerî bîyî şovalyeyê nê zîyaretgehî. Wezîranê Erdoganî bêrayîrîye kerde, wezîfeyî ra ameyî girewtene la dîwanê girsî de nêameyî muhakemekerdene. Çike hêzê huqûqî çin o la huqûqê hêzan esto.

Îdarekaran seba maldarbîyayîşî ci nêkerd ke. Qanûnê îhaleyî yê dewlete çend reyî ame bedilnayene. Homa ke Partîya Edalet û Raverşîyayîşî (AKP) nêamebî îqtîdar, seba pêkerdişê Yewîya Ewropa qanûnê îhaleyî vejîyaybî. La hukmatê Erdoganî no qanûn 20 serran de fekafek 200 reyî avurna. Îhaleyan de fêlbazîya girse ameye ramitene û derûdormeyê Erdoganî maldar bî.

**Rejîm kaosî ra mird beno**

Rejîmê Erdoganî "kaos" ra xo mird keno. Eke nîzamê huqûqî bibo, Erdogan ganî yo hesab bido. Coka o huqûqî gêno binê linganê xo. Coka Erdogan hîyerarşîyê norman nas nêkeno. Nê konteksî de tenê maddeyanê qanûnê bingeyî yê Tirkîya analîz bikerîme. Ma vajîme, maddeya 104. de yeno nuştene ke serekkomar serê dewlete yo, yewîya "şarê tirkî" temsîl keno û caardişê qanûnê bingeyî çimdar keno. Gelo nika Erdogan goreyê na madde têgêreno? Merdim sey serê dewlete tênêgêreno, qasê serê sermayedaranê ke dizdîye kenê têgêreno. Eke yewîya şarê tirkî kamîya kurdan teşmîl kena, o wext serekkomarî oncîna çend reyî no norm binpay kerdo. Ey bi defayan Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) rê "terorîst" vat. Rixmo ke partîye legal a, Erdogan weçînitoxanê partîye rê terorîst vano. Yanî yewîya şarî lete keno. Sermîyano ke qanûnê bingeyî binpay keno, senî caardişê qanûnê bingeyî çimdar bikero?

Maddeya qanûnê bingeyî ya bîna ke zafî yena binpaykerdene 138. ya. Madde de nusîyeno ke dadgerî wezîfeyê xo de xoser ê. La Erdoganî dadgerî girewtê binê serdestîya xo. Destûr nêdano ke ê bira xosere bigêrê. Çend dewayan de înan ser o teda kerde. Mîsal dewaya Selahattîn Demîrtaşî de Erdogan sey dadgerî têgêra. Çend reyî vat "Demîrtaş terorîst o yan sucdar o". Kotî de veyve esto, Erdogan uca de zama beno.

**Quîd Jurîs?**

Rejîmê Erdoganî de maddeya ke bi waştişê girsî yena caardene maddeya 127. ya. Na madde vera îradeyê şarê kurdî pê bêrîye ameye şuxilnayene. Qewetê ke huqûqî virazenê, qanûnî vera dişmenanê xo şuxilnenê. Goreyê na madde kêmî-zêde pêro şaredarîyanê kurdan de qeyûmî ameyî cakerdene. Ê qeyûman sey heramîyan bajaranê Kurdistanî de bêrayîrîye û dizdîye kerde. Çiqas muşterekê şarîyê ke estbî girewtî binê wayîrîya xo. Ê sey sunganê axûyinanê ke hêgayê kartolan çin kenê yê. Ê teyna bêrayîrîye nêkenê, heman wext de hêrîşê ercanê şarê kurdî zî kenê. Mîsal qeyûmê Êlihî çend rojî verî peykerê Cegerxwînî dart we. Verê cû qeyûman hêrîşê peykerê Ehmedê Xanî û nameyê Celadet Elî Bedîrxanî zî kerdbî. Felsefeya Kantî de ameyêne persayene "quîd jurîs?". Yanî heq çi yo?

Bikilmî "qeyûmîye", polîtîkaya qirkera bîn a. Sayeyê aye Erdoganî serdestîya xo newe ra awan kerde. La na polîtîka zî Erdoganî nêseveknena. Borîya Îsrafîlî seba ey cinena. Muzeya dîktatoranê merdeyan de cayê xo do bigêro.

Nizamettin Ozturk

# Dîmenên tên dubarekirin!

Di van salên dawî de dîmenên xof derdikevin holê. Lê civaka kurd û dostên gelê kurd şaş namînin! Lewre mirovên beriya nifşên îro, di vî welatî yan jî li ser erdnîgarîya Rojhilata Navîn dijîn, herî zêdetir şahidên dîmenên wiha bûne.

Lê nifşên îro, her çiqas şahidên bûyerên sedsala borî nebin jî, ciwanên jîr û jêhatî û taybet jinên ciwan û wêrek bi hişmendiya azad xwe bi rêxistin dikin û dikevin dû heqîqetê. Bûyerên demên borî û yên îro didin berhev; dubarebûna dîmenan dibînin û guherandineke erênî teqez nabînin.

Tê xuya ku, hê jî gelê kurd netewa pileya (derece) yekemîn nayê dîtin! Çend sal berê generalekî artêşa tirk, ji gelê kurd re gotibû 'qaşo welatî'. Helbet nêzîkbûna şexsên xwedîşiyan (muktedîr) li hemberê gelan wisa be; kesên 'netewbûnê ji xwe re heq dibînin' helwesta wan çawa be, hûn bi hesibînin.

Di newroza 2005'an de li bajarê Mêrsînê li dijî kurdan bûyerek wekî provakasyon û bêbextiyek mezin çebibû. Piştre êrîşên mezin hatin ser gel.

Lê sê-çar sal şûnde kiryarê provakasyonê derket holê. Encama dozê çava bû ne diyar e.

Ka em li cihekî zêde bilind nebin, lewre di van salên dawî de tiştê ku qewimîn di raya giştî de cih girtiye. Li bajar, gund û zozanên kurda hiqûq û dad li gora demên awarte meşiya e. Gel, di dema hilbijartinan de li gorî îradeya xwe şareder û parlementeran hildibijêre, lê bêdaraz bi destê wezareta navîn ji peywir hatin girtin û qeyûm hatin avêtin. Gelek parlementerên hilbijêrî destnedayîna wan hat rakirin û gelek ji wan avêtin zindanan. Bi vî awayî vîna gel tune hesibandin. Ji bo vê yekê gelê kurd gelek dil xemgîn û tengezar e.

Gelê kurd gelemperî endam, hilbijêr û alîgirê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) e. Lê li ser siyaseta gelê kurd bandor, zext û zor bênavber tê meşandin. Li dijî van zextan gel bi her awayî nerazîbûnên xwe nîşan dide. Her wiha li ser çapemeniya azad û saziyên di çarçoveya zagonî de hatin damezrandin gelek ji wan hatin qedexe kirin û kilît deriye wan xistin e. Bêgûman ev êrîş ne tenê li ser gelê kurd e. Çend roj berê, li Enqerê karmendek jin eslê xwe ji Somaliyê ye, lê ya niha bûye welatiyê Tirkiyeyê, ji xwe re dikanek li vir vekiriye. Di tabeleya xwe ya dikanê ve sê rengê ala Somaliya daleqandiye. Polîsên Enqereyê di ser dikanê de digirin û vê tabelaye bi renge spî boyax dikin. Jina ku xwediyê dikanê derdikeve televîzyonê û digot: "gelo ji ber ku rengê min reşe ewqasî di ser min de hatin?" Min gava ku ev gotin bihîst ez keniyam. Lewre armanc ne ew e. Ango ne rengê wê ye. Hedefa wan ew sê rengê ku di dikana xwe ve kiriye ye.

Êdî dem dema hilbijartinê ye. Dîsa di televîzyonan de gelê kurd tînin rojevê. Gelê kurd heta tu carî bi van tiştên xapînok neketiye. Bi saziyên demokrat û bi gelen din re helbet têkilî çê dike. Di vê mijarê de beriya çend rojan siyasetmedarê kurd Ahmet Turk li ser pirsgirêka kurd hevpeyvînek kiribû. Ahmet Turk di wî hevpeyvînê de xwestekên gelê kurd parve kiribû.

Siyasetmedarên kurd ên hêja gelek zêde ne. Bi sekna û xebatên xwe bi heqî, pêşengiya gel bi cih tînin. Hevserokên HDP'ê jî bi vî rengî ne. Pervîn Bûldan jî di 21'ê hezîranê de di civîna koma meclisê de axivî bû û bal kişandibû ser mijarên di rojevê de. Peyamên gelek girîng ji raya giştî re parve kiribû. Peyamên ku hatî dayîn net bûn. Sed sala ku derbas bûyî û sedsala niha em di nav de nirxandibû. Peyamên gelek girîng dabû siyasetmedaran jî. Di peyamên ku dayî de hem desthilatdarî hem jî mûxalefet rexne kiribû.Li gorî van peyaman divê herkes li hemberî gelê kurd bi baldarî tevbigere.